

Em tewsiye dikan ku tu fayla PDF'ê tenê li ser ekranê bixwînî û ew danexînî ser komputera xwe. Gava mirov PDF'ê diveke, di hin rewşan de, ew xwe bi otomatîkî dadixîne ser komputerê. Hingê vê faylê ji nav dosya bi navê Faylên Hatî, paqij bike. Heger te dîsan PDF'ê daxistibe ser komputera xwe, piştî te xwand, ew bavêje nav qutîka çopê û bitikîne ser bişkoka 'Qutîka Çopê Valake'. Heger tu bixwazî bizanî ku mirov çawa dikare mêtûya malperê jêbibe, ku şopa serdana xwe veşêre, hingê li wê heman ciyê, ku te vê PDF'ê daxist ser komputera xwe, bitikîne ser bişkoka 'serdanveşartin'ê. Li heman ciyî, bişkokek sor heye ku gava te tikand ser, ew te bi hêsanî dibe ser malperek din: www.google.se

Hûn bi xêr hatin malpera agehiyê ya polîs a derbarê tawanê li pêwendiyêñ nêzîk

Li vê malperê, tu wek ew kesê ku li ber xetera tawanê yî, dikarî agehiyêñ derbarê mafê xwe werbigirî û her wisa jî ew agehiyêñ, ku polîs çawa dikare alîkariya te bike, bizanî. Her wisa, ew kesê ku wek şahid tê digehe ku guman heye, li derdorêñ xwe yên nêzîk, kesêñ berxeterê tawanê hene, ew jî dikare ji vir agehî bistîne. Tu bi xêr hatî vê malperê!

Di pêwendiyek nêzîk de çi wek tawan tê jimartin?

Tawanêñ li pêwendiyêñ nêzîk tê wê wateyê, ku ew kesê berxeterê tawanê ne, bi kesê tawankir re yan zewicî ne, yan hevjîn (sambo) in, yan jî cudajîn (särbo) in, yan jî, bi tawankir re xwedîzarok in.

Her wisa jî dibe, ku mirov ji hêla dêbav, xwuşkûbra, yan jî, xizmêñ xwe yên din ve, bikeve berxetera tawanekî. Ku wek tê gotin, tawankariya namûsê. Ev tawan, dikare wek nimûne zextûzora fizîkî, yan psîkolojîkî û yan jî seksuel (cinsî) be. Gava yek ji pertneran, partnerê din neçar bike, yan jî, bixe pişt kilîtê, yan jî, bê destûr biçe mala partnerî, van kirinan; wek tawan têñ jimartin. Tawanêñ li nav pêwendiyêñ nêzîk, dikevin beşê dozêñ giştî, ku polîs erkdar e ku pişkinînê li ser bike – û kesê berxeter nikare pêşî lê vê pişkinîna polîsî bigre. Pişkinîn bi destê dozger tê kirin.

Qanûna bêrûmetkirina aramîyê

Sala 1988an, qanûna bêrûmetkirina giran a aramîyê û qanûna bêrûmetkirina giran a aramiya jinan derket. Qanûna bêrûmetkirina aramîyê, tê çi wateyê li ser vê malperê www.bra.se bixwîne.

Çi wek tawan tê jimartin?

Ji bo destpêkirina pişkinîna polîsî, divê sedemek hebe, ku mirov texmîn dike, ku tawanek ji tawanêñ ku dikeve çarçiveya doza giştî, hatiye kirin. Wek nimûne; tawan ew e, ku kesekî, ji ber derbêñ lêdanê, reşûşîn bûye, xwedîbirîn e, yan jî, ji ber zextûzora kesekî li nêzîkî xwe, xwedî zirarêñ din e. Yan jî, ew kes, jin yan mîr, vedibêje, ku ew li ber xetera zextûzorê maye. Yan jî, wek nimûne; bi riya gefdayinêñ SMS'ê, yan e-mailê, berxeterê zextûzor û gefêñ yekî li nêzîkî xwe bûye.

Ma hatiye serê te?

Ev cûre tawan, li nav her cûre pêwendiyen pêk tê; li nav hemû cûre çînên civakî û li seranserê welêt. Ev tawan, piraniya caran, li nav malê diqewime û loma jî, ji hêla polîs û sîstema dadimendiyê dijwar tê kifşkirin. Ji ber vê jî, mudaxelekirin û alîkarîkirina ji bo kesê berxeter, dikare dijwar be. Gelek caran, sedem zikreşî yan jî, dijîtiyê dema cihêbûn û heyberdanê ye. Piraniya caran ji ber sedema alkolê ye. Ne kêm car in, ji ber wê sedemê ye, ku partnerek dixwaze li ser partnerê din deselatî û kontrolê bike. Her wisa jî, dikare ji ber ew sedeman be, ku jê re dibêjin; tawankariya namûsê, ku malbatek ji bo vê yekê, kontrolê li ser endamên xwe dike, ku tiştek nekin. ku şerefa malbatê bikeve nav macerayê. Yan jî, ceza didin endamek malbatê, ku ew xwe li hevber qaîdeyên malbatî ne livandiye.

Hejimarek nenas ên berxeter

Ev cûreyê tawanê yê asayî ye. Mirov tam nizane, ku çend kes dibin berxeterê vî tawanî, lê belê, li gor Encumena Pêşîlégirtina Tawanê (Brottsförebyggande rådet) BRÅ, ew %25ê ji hemû kesên, ku dikevin ber xeterê, giliyên xwe dikan. Sala 2011ê, 35 035 gilî çêbûn, ku mér, jin û zaro berxeterê lêdanen bûbûn. Ji %69ên van gilînameyan, ew tawan bûn, ku gilîker ji hêla partnerê xwe yê nuha, yan jî ji hêla partnerê xwe yê berê, hatiye berxeterkirin. Heger tu jî berxterî bî, bi gotineke din tu ne tenê yî.

Biçûkkirin adetî ye

Gelek kesên, ku ji hêla partnerê xwe dibin berxeterê tawanê, dîsan jî, demên dirêj di nav wê pêwendiyê de dimînin. Ji ber gelek sedeman, dibe ku mirov mayina li nav wê pêwendiyê hildibijêre: dibe ku mirov hîna jî, ji partnerê xwe hez dike, mirov dikeve taswasa wî/wê, gelo wê jiyanâ partnerê/a mirov wê çawa bimeşe, heger ku mirov bi riya xwe de here. Yan jî, mirov ji serencama ji hev cihêbûnekê ditirse. Her wisa jî adetî ye, ku ew kesê berxeterî ye, ew bi xwe zextûzora ku lê dibe, biçûk dike û 'li ba dike diavêje helekê'. Ji ber ku piştî demeke dirêj li bin zextûzora psîkolojîkî û fizîkî, mirov xwe kêm û biçûk dibîne. Mirov qebhetê di xwe de dibîne û ew întîba pê re çêdibe ku mirov xwe layikê zextûzorê dibîne.

Sînyalên hişyariyê

Çend sînyalên asayî yên hişyarkirinê hene, ku dikarin nîşanî mirov bidin, ku li nav pêwendiyekê, hemû tişt ne wek xwe xuya dike. Li malpera RFSL lîsteyek pirson heye, ku ev dikare ji te re bîbe alîkar, ku tu bikaribî van sînyalên asayî nas bikî. Her wisa jî, tu li ser vê malperê dikarî lînkên rêxistinên din bibînî, ku gava te pirs û hizrek hebe, yan jî, gava tu yekî berxeter nas bikî, berê xwe bidî wir.

Agehiyên bêhtir

Encumena Pêşîlégirtina Tawanê (Brottsförebyggande rådet) BRÅ ji bo kesên HTB www.rfsl.se/brottsoffer

Telefona piştgiriyê ji bo jinên, ku li bin xetera gefê, zextêuzorê yan jî destdirêjiya seksuelî ne.
www.kyinnofridsljen.se

Gilî bikî yan nekî?

Ji bo polîs qet guman nîn e, ku tawanê li pêwendiyêne nêzîk gerek e ji polîs re werin gilîkirin.

Lê belê dîsan jî, gelek kesên ku berxeter in, ji gilîkirina ji polîsî re, xwe didin paş û gilî nakin. Ev dibe ji ber vê yekê be, ku ew kesên berxeterbûyî, hîna jî, ji bo partnerê xwe, xwedî hest in. Yan jî mirov ji cazakirinek li pêşerojê ditirse. Her wisa jî, bi hev re xwedîbûna zarokekê, dikare bibe sedem, ku mirov giliya tawanê li ser partnerê/a xwe nake. Her dîsan, bûyer wek tiştekî taybet, yê mirov be û ji ber wê xwe bi qebehet dibîne û şermê dike û loma ji bo vê, xwe tawanbar dike.

Gilîkirin girîng e

Heger tu li bin xeterek bi vî cûreyî bimînî, divê ku tu li nik polîsî gilî bikî. Gilînameyek li nik polîsî, dikare bibe sedem, ku ev rewşa jiyana te ya bi zextûzor û nearamîkirinê li ser jiyana te, bi dawî be.

Kesên din jî dikarin gilî bikin

Gelek caran, qurbaniyêne tawanê, gilîname didin polîsî. Lê adetî ye, ku dost û cîran jî, yan jî cîranêne partneran jî, tawan li nik polîsî gilî dikan. Heger te guman heye, ku kesek berxeterê tawanekî ye, pêwendî bi polîsî re bike, ku polîs bi xwe biryarê dide, ku ev rîpêşkirin wê pişkinîn li ser bibe yan na.

Baş e ku li ser bihizirî

Çend tişt hene, ku baş e mirov li ser bihizire, heger mirov li nav pêwendiyek bijî ku li wir, berxeterê gefê, zextûzorê yan jî bêaramîkirinan dimîne.

Sirê xwe ji bo ew dostênu ku tu bi wan bawerî dihênen, bibêje û rewşa xwe ji wan re veke. Ew dikarin peyvîn te di dadgehêk muhitemel de piştrast bikin.

- Bi Mala Jinan (kvinnojour) yan Mala Mêran (mansjour) re pêwendî bike. Ew jî dikarin peyvîn te di dadgehek muhitemel de piştrast bikin.
- Rojnivîsek binivîse, ku tu li wir bi belge nîşan bidî, ku tu li ku derê û kengî hatiyî biçûkxistin, tu çawa gef yan jî lêdan xwariyî. Her wisa jî, te çawa derb xwariye û derb li kîjan derê laşê te ketiye.
- Kincêne te yên ku dema lêdanê, yan jî dema hêrişa cinsî, li ser te bûn, ne soyî.
- Birîn û derbêne li te ketine, bi belge nîşan bide û te derfet hebe, wêneyêne wan jî bikşîne. Yan jî bide doktorekî, ku ji bo te ew bikin belge.
- Wan gefdayinêne ku bi riya telesekreter, e-post yan jî SMSê li te tê kirin, biparêze. Paşê jî ew verêke ji dost û hevalêne xwe re, ku ew ji bo te werin parastin. Ev dikarin bibin delîlêng girîng.

Piştgirî û parêzgeh

Gelek kes ditirsin ku gilî bikin. Dibe ku ji ew kesê ku gilî li ser bikin, ditirsin. Polîs dikare nirxandinek li ser rewşa gefdayin û rîska li ser te heye bike, da ku pêwîstiya te ya parastinê binase.

Li gor cûreya gefdayinê, pileyên cuda yên parastinê hene. Tu dikarî ji polîs alîkariya şêwirdariyê û çavdêriyê bibînî û hin navgînên alîkar ên teknîkî yên cihêregn werbigirî, wek nimûne jî, pakêtek parastinê ya ji telefona bi alarma GPSê û alarma akustikê pêkhatî. Tu her wisa jî dikarî, bi kesekî her tenê bi te re pêwendîdar be, pê re bidî û bistînî û bibî xwedî derfeta agehî- û axiftina ewletiyê.

Polîs, her wisa li civakê bi tedbîrên din ên, ku te biparêze hevkariyê dike. Wek nimûne, şaredarî dikare ji te re malekî parastî bide û her wisa jî, tu dikarî piştgiriyê ji Dezgeha Xizmeta Goriyên Tawanê (brottsofferjour) werbigirî. Her weha, rêxistinê dilxwaz jî, ku alîkariyê ji te re bikin, hene.

Dozger dikare biryar li ser qedexeya pêwendîkirinê bide. Ev tê wê wateyê, ku ew kesê, ku muhitemel gef li ser te dike, êdî nikare bi riya seredanê, yan telefon û yan jî bi riya pêwendiyên wek e-maflê, pêwendî bi te re bike. Li gelek qereqolên polîsî, ew kesê ku jê re dibêjin Alîkarê Qurbanîyên Tawanê (brottsoffersamordnare) hene, ku ew ji te re dikarin bêhtir agehiyan bidin.

Tu her wisa dikarî alîkariyek bi navê Tezmînata Goriyên Tawanê (brottsofferersättning) werbigirî, lê belê, hingê gerek e, gilînameyeke te ya ji polîs hebe. Gava gilînameyek te hebe, hingê jî tu dikarî, ji şîrketa sigortaya xwe ji bo wergirtina tezmînata zirarê serî lê bidî.

Agehiyên bêhtir

Piştgiriya Tezmînata Goriyên Tawanê: www.brottsoffermyndigheten.se

Telefona piştgiriyê ji bo jinênu ku berxetera gefê, zextûzorê û destdirêjiya cinsî ne:

www.kvinnofridsljen.se

Çawa mirov gili dike?

Heger tu yan jî kesekî tu dinasî, rastî berxeteriya tawanekî bûye, yan jî gef lê hatiye kirin, divê hingê tu ev ji polîs re gilî bikî.

Tu dikarî ji vê hejimara telefonê re 114 14, yan jî ji 112 re telefon bikî, heger lezge be. Her wisa jî, tu dikarî yekser herî qereqoleke li nêzîkî ciyê ku tu lê dirûnî. Heger bixwazî, ji kesekî heval yan hevkarê xwe, ku te bawerî pê heye, alîkariyê bixwaze.

Çi diqewime paşê?

Piştî ku polîs gilînameya te wergirt, ji bo jêpirsînê wê bangî te bike, ku tu hinekî bêhtir li ser vê rewşê bahs bikî. Li dema jêpirsîna polîsî, gelekî girîng e, ku ta ji destê te tê, tu bi hûrgulî bahs bikî, ku çi qewimiye. Tu bûyî berxeterê kîjan cûre gef, zextûzor yan tawanekî din. Ji hêla kê û kîjanan? Çend demdirêj ev berdewam kiriye? Çawa? Ji bo berdewamkirina li ser gilînameya te, bersivdana van pirsan gelekî girîng e.

Pêşlêkolîn

Pişkînîna tawanê ku jê re dibêjin pişkinîna destpêkî, ji bo berhevdana agehiyên derbareyê bûyera qewimî ye. Ev kar bi destê dozger tê kirin. Gava pêşlêkolîn diçe serî, dozger biryarê dide, heger ku têra xwe belge û spartek hebin, ku mirov bikaribe yê ku gumanâ tawanê li ser heye were tawanbarkirin. Tawanbarkirinek diçe ber daniştinek devkî ya prosesa dadgehkirinê li dadgehê, ku jê re dibêjin mihakeme. Li wir, tu û ew kesê tawanbarkirî (kesê ku doz li ser hatiye vekirin) û hebe şahîd, têne jêpirsînê. Paşê dadgeh nirxandina xwe dike û biryarê dide. Heger dilê te û dilê ew kesê tawanbarkirî li ser biryarê ne li cih be, mirov dikare itîraza vê biryara mehkemê li dadgeha îstînafê bike.

Gelo çi dibe heger doz were dawî lêhanîn?

Dibe ji ber nebûna belge û spartekan, doza mirov were dawî lêhanîn. Ev nahê wê wateyê, ku polîs û dozger bawerî bi gotina kesê berxeterbûyî nahênin. Lê belê pir vekirî, wan bawerî bi vê nîn e, ku heger belge û spartek û şahîden gerek, tinebin, ku peyva kesê berxeter dipeyitînin, gilînameyek nikare here ber dozvekirinê.

Agehiyên bêhtir

Xwendegeha mihakemê: www.rattegangsskolan.se

Kesekî berxeter dinasî?

Heger tu li nav pêwendîyeke nêzîk bûbî şahidê tawanekî, yan jî, heger tu kesekî li ber xeteriya tawanekî ku li dorûberên te ye dinasî, tu bi xwe jî dikarî vê li nik polîsî gilî bikî.

Gilîkirina vê cûre tawanê, li nik polîsî, dikare dijwar be. Heger tu nikaribî gilînameyek fermî jî bikî, dîsan dikarî pêwendî di gel polîsî bikî û şik û gumanên xwe wek navnenas bibêjî ji polîsî re. Hingê erkê ser şanê polîs e, ku vê gilînameyê bişopîne yan na. Heger tu li besê sexbêriyê û lênerînê dixebitî, hingê, di hin rewşan de erkê ser şanê te ye, ku heger tu bibînî ku kesek berxeterê tawanekî ye, tu giliyê bikî.

Guman dikî ku zarokek berxeter be?

Heger te guman hebin, ku zarokek li ber xeterê ye, tu dikarî vê wek navnenas li dezgehêن civakî (sociala myndigheterna) yên li şaredariya xwe gilî bikî (tu ev li malpera şaredariyê dikarî peyda bikî). Ew hingê li ser vê lêhûrnerînek dikan û li nik polîsî gilî dikan. Heger te guman hebin ku zarokek li ber xeterê ye û tu li besê sexbêrî, xwendegeh yan jî lênerîna zarakan bî, erkê ser şanê te ye ku tu her dem gilî bikî.

Li vir piştgirî û alîkarî werdigirî

Mafê Zarok Li Civakê: www.bris.se

Zarokan Rizgarke: www.raddabarnen.se

Polîs hêza xwe dide hev

Polîs tawanên li nav pêwendiyêñ nêzîk pir ji nêzîkî ve dişopîne. Gava ku komeke mazin xelk li nav dîwarêñ malê berxeterê gefdayin û zextûzorê bin, ev kêşeyeke mazin a civakî ye. Bi ser de jî, ev tawanek e, ku ne tenê li hevber qanûnê swêdî ye, her wisa jî, ev li hevber beyannameya Yekîtiya Milletan a derbarê mafê mirovan e.

Pêşewazîkirin tayînker e

Xebata polîsî, li ser van peyvan tê meşandin 'angajebûn, efektif, û peydabar." Li hemû hevgirêdanan girîng e, lê belê, belku li rewşa tawanên li nav pêwendiyêñ nêzîk, bêhtir girîng e.

Em dizanin ku şêweya me ya pêşewazîkirina qurbaniyêñ tawanê, ji bo wêrîna gilîkirina kesêñ berxeter, xwedî wateyeke tayinker e - her wisa jî, ji bo birina serî ya birtyara wan a gilîkirinê. Her bi vî awayî, tedbîrên destpêkî yên pişkinînê jî, ji bo pişkinîneke serkeftî girîng in. Wek nimûne, ev dibe ku derbarê jêpirsîna şahîdan û belgenameyêñ zirarêñ kesê berxeterbûyî jî be. Girîng e ku were destnîşankirin, ku polîs, erkdar e, ku li dema pişkinînê bêalî be û her wisa jî, polîs erkdar e, ku tiştê baş û her weha tiştê nebaş ê ji bo kesê gumanjêkirî li ber çav bigre û biparêze.

Stratejiye millî

Polis her dem têdixebite ku ji bo xwe baştır bike, ku çawa ev cûre tawan bipiŞkîne. Armanca ew e, ku piştgirî were dayin, ku bêhtir kes biwêrin gilî bikin, hejimara nenas a kesêñ berxeterî ne, kêm bike, efektîvîteya xwe ya xebatê bêhtir bike û hejimara gilîyêñ ku diçin ta mehkemê, pirtir bike. Perwerdeyêñ nuh ên baştıkirî, jîrbûna polîsî, bêhtir kirîye. Agehî û pevguhestina pêzanînê, hem li ser Internetê û hem jî di gel dozger û daîreyêñ fermî û rêxistinêñ dîlxwaz re, vê kêşeyê li ser xalêñ rojevê biriye asteke bilindir. Her bi vî awayî, perwerde jî, ji bo pişkinînê li ser berxeteriya zarokan û pişkinînê li ser tawanêñ derbareyê namûsê, hatiye ber bi pêşxistin û baştıkirin.

Zarok çawa li bin bandorê têñ hiştin?

Ew zarokêñ ku dibin şahîdêñ bêaramîkirinan, gef û zextûzora li malê, hem psîkolojîkî û hem jî fîzîkî zirarê dibînin.

Lêkolîn nîşan didin, ku ev zarok, bêhtir dikevin taswasê, endişê, buhran û post-traumatîk stres sendromê û ji zarokêñ din çavşor dibin. Loma girîng e, ku mirov zarokan ji bîr neke. Her çend ku dêbav ne bawer bin, ku zarokêñ wan ne bûne şahîdêñ zextûzor û gefdayinan jî. Her wisa lêkolîn hene, ku destnîşan dikin, ku her çiqas jin werin lêdan, xeter ew çend jî mazin dibe, ku zarok hem ji alîyê dê û hem jî ji alîyê bavê ve tê lêxistin.

Polîs çawa bi zarokan re dixebite?

Li nik polîsî serokêñ taybet ên jêpirsîna zarokan ên ku taybet perwerdebûyî hene, ku ev kes, hînbûyiyyêñ xeberdana bi zarokêñ ku bûne berxeterê hemû cûre tawanê ne. Zarokêñ ku li pêwendiyêñ xwe yên nêzîkî, bûne şahîdêñ zextûzorê, wek qurbaniyêñ tawanê têñ jimartin û wan maf heye, ku Tezmînata Zirara Tawanê (brottsskadeersättning) werbigirin. Ji bo ku zarok bikaribin vê tezmînata zirara tawanê werbigirin, gerek e ku gilînameyek polîsî her dem hebe.

Malên taybet ên zarokan

Li seranserê welêt, li gelek ciyan, ew malên ku jê re dibêjin Mala Zarokan (barnhus) hene, ku polîs, dozger, doktor û daîreyên fermî yên civakî, li wir hemû li bin baniyekî kombûyî ne. Ev tê wê wateyê, ku pêwîstî çenabe, ku zarok li navbera gelek daîreyên fermî werin birin û hanîn, ku ev ji zarokan re hinik alîkar dibe. Her wisa jî, ev ji bo kar û hevgirêdanêni di navbera daîreyên fermî de, dibe sedema rêvebirineke bi hêsanî, ku ev ji bo wan daîreyên fermî, ku li ser vî karî digerin, dibe hoyek baş, ku ew karê xwe yê pişkinîne di pileyeke bilind û bi kaflitir bi cihbihênen.

Agehiyê bêhtir

Mafê Zarok Li Civakê: www.bris.se

Zarokan Rizgarke: www.raddabarnen.se

Berxeterê tawanênamûsê?

Tu li vir dikarî bixwînî, ku kîjan cûre piştgirî û alîkarî divê tu werbigirî, heger gava ku tu bibî berxeterê tawanênamûsê.

Ma tu li nav rewsek welê dijî, ku tu nikarî li ser awayê kinclixwekirinê û bi kê re bidî û bistînî, bi xwe bîryarê bidî, yan jî, ji bo ïataatkîrinê, lêdan li te dibe? Ma tu wisa xwe hîs dikî, ku ji hêla dêbav û xizmîn te ve, li ser te çavdêrî û kontrolkirin tê kirin? Ma tu bêgav dimînî, ku tercîha xwe ya seksuel veşêrî? Wê gavê dibe ku tu berxeterê yek yan gelek ji van tawanîn î, ku jê re dibêjin tawanbariya namûsê.

Hem keç û hem jî kur berxeter dîbin

Hîna jî berpêskirinek heye, ku dibêje, zextûzor û tepesriya ku pêwendî bi pirsên namûsê heye, tenê tê serê qîz û jinan, lê belê, her wisa kur û mîr jî dîbin berxeter. Kur û mîr piraniya caran ji qîz û jinan azadtir in, lê ew jî her wisa dîbin berxeterê zewaca pîlankirî û zewaca bi zorê. Her wisa, ew dikevin bin erkdariya ku çavdêrî û kontrola xwung û kuzenêni xwe bikin. Heger law, van hêviyan bi cih nehênin, ew bi xwe jî dikarin bikevin ber xetera zextûzor û tepeseriye. Hin rewşen naskirî hene, ku law û kurêngênc, ji ber hilbijartina partnerê, yan ji ber awayê rabûnûrûniştina xwe ya seksuel a ku cuda tê pejirandin, hatine kuştin.

Tawanênamûsê yên li hevber homo, nêremo- û transeksuelan

Kesên homo, nêremo- û transeksuel ku li civaka xwedîçanda namûsê dijîn, bi taybetî berxeter in. Li gelek civakan, homo, nêremo- û transeksuelî, mijareke tabû ye û baweriya wan ew e, ku ev kirekî bêqanûnî ye. Ji lew re, rîsk û xeter bêhtir dibe, ku ew, taqîb bibin, ji civakê werin dûrxistin û rastê zextûzorê û kuştinê bibin. Lawekî yan qîzekî mirov, ku homo, nêremo- û transeksuel e, ev dibe barekî ji malbatê re, ji ber ku ev dikare bandorekî nebaş li ser navûdengê malbatê û namûsa malbatê bike. Seksualiya zarokêni malbatê, ne tenê namûsa wan bi xwe, her wisa jî, derfeta zewaca xwuşkûbira jî dixe macerayê.

Qanûn çi dibêje?

Heger bi termên dadgerî were gotin, ev 'çavdêrîkirin' û 'bandora' ku ev kesên ku dikevin berxeterê wî, dikare were wê wateya jideststandina azadî, zordesî, gef, bêaramîkirin yan jî lêdanê. Ev tawanêن ciddî ne. Heger tu, yan jî, kesekî ku tu dinasî, hinek bûbe berxeterê van tawanan, yan çend ji van tawanan, divê tu li nik polîsî gilî bikî. Heger te pirsên derbarê zextûzora namûsê hebin, bi polîsî re pêwendî bike, yan jî, bi Mala Qîz- yan Jinan (kvinnojouren) re pêwendî bike.

Pirs & Bersiv

Pirs: Malbata min vê havînê dibe ku here welêt û dibe ku ez bêdil û bi zorê werim zewicandin. Ez çi bikim?

Bersiv: Pêwendî bi polîsî yan jî bi Daîreya Sosyalê (socialtjänsten) bike û gumanêن xwe ji wan re bibêje. Grîng e, ku heger sedema gumana zewaca te ya bêdil, hinek jî hebe, çi dibe bila bibe, gerek e tu vê geşte nekî. Heger tu li derveyî welêt bî, hingê daîreyêن fermî yên swêdî wê nikaribin bi alîkariya te rabin.

Pirs: Ez li ku derê dikarim alîkarî werbigirim heger ez li bin xetera gefê bim?

Bersiv: Heger heqaret li te hatibe kirin û heger gef li te hatibe kirin, divê tu yan berê xwe bidî polîsî, yan jî Daîreya Sosyalê (socialtjänsten) yan jî, yek ji wan Mala Jinan (kvinnojouren) ku li nêzîkî te hebin. Mala Jinan (kvinnojouren) piraniya caran pêwendî bi Daîreya Sosyalê (socialtjänsten) re heye û dikare di rewşike lezge de malekî parastî (skyddat boende) bide te û pêwendiya te, bi gelek daîreyêن fermî re bike. Li seranserê welêt, li gelek ciyan malên parastî hene, ku personelên wir, xwedî perwerdeya taybet in, ku bi alîkariya ew kesên berxeterê tawanêن namûsê dikan. Gelek ji van malan, zarokan jî werdigirin, hem jî di rewşen lezge de.

Pirs: Ez ê çend dirêj li malên parastî bimînim?

Bersiv: Te maf heye ku te çend dirêj pêwîstî hebe, tu dikarî li malên parastî bimînî, ta ku ji te re malekî tê peydakirin.

Pirs: Gelo ez herim polîs wê çi bibe?

Bersiv: Polîs pişkinînê dike, ku bizane çi qewimiye û gelo sedem heye, ku li vê pişkinînê berdewam bike. Ji ber ku tu bûyî berxeterê tawanekî, loma bang li te tê kirin, ku tu werî jêpirsînê. Polîs jî, kesên gumanjêker wê bide ber jêpirsîne û her wisa jî, şahîdîn wek endamêن malbatê û kesên din ên tevlêbûyî. Li herî dawîn, pişkinîn dikare here ber dozger bo tawanbarkirina yek yan çend tawankiran.

Pirs: Gelo ez ê çawa xwe biparêzim?

Bersiv: Wek her caran, polîs nirxandina rewşa rîskê dike û dikare bi gelek cûreyêن parastinê bi alîkariya te rabe, wek nimûne alarma hêrîşê. Li rêxistina polîsî, her wisa kesên bi navê Alîkarê Qurbaniyêن Tawanê, (brottsoffersamordnare) yan jî, yên wek van hene, ku bi karê piştgirîkirina ji bo qurbaniyêن tawanê dixebeitin. Gelek dezgehêن poîsî, her wisa jî, bi rêxistinêن îdeal ên wek Mala Jin û Qîzan re di nav hevkariyê de ne.

Pirs: Gelo ez dikarim piştgiriye li daniştina mehkemê werbigirim?

Bersiv: Tu dikarî alîkarî ji Alîkarê Tawanbarker (målsägandebiträde), ji hiqûqnasekî werbigirî. Her wisa jî, tu dikarî li daniştina mehkemeyekê, piştgiriya şahîdî werbigirî, ku agehiyêن pratîkî û alîkariyê dide te. Ev xizmet bêpere ye.

Agehiyêن bêhtir

Brottsofferjourernas Riksförbund (Federasyona Malên Jibo Qurbaniyêن Tawanê) ji bo baştirkirina rewşa qurbaniyêن tawanê dixebite: www.boj.se

Zexta Namûsê: www.hedersfortryck.se

Dina rättigheter (Mafên Te): www.dinarattigheter.se

www.flicka.nu

Rêexistina Giştî ya Malên Jinan: www.roks.se

Xwendegeha mihakemê: www.rattegangsskolan.se

Federasyona Malên Jinan a Swêdê: www.kvinnojouren.se

Kêmendamî?

Tawanê li nav pêwendiyêن nêzîk, li nav her cûre pêwendiyân pêk tê. Her wisa li nav pêwendiyênu ku yek ji wan muhtacê destê ew ê din e – wek nimûne ji ber kêmendamîyê. Ev dibe ku ji ber kêmendamîyeke fizikî jî be. Her wek ji ber kêmendamîya lebata bi tixûb yan jî, ji ber kêmendamîya çavkorî û guhgiranbûnê. Her wisan jî, ji ber kêmendamîya psîkolojîkî yan aqilsivikiyê.

Ev komên mirovan pir bêhtir zehmetiyan dibînin, ji ber ku ew piraniya caran li destê wî mirovî dinerin, ku hem partner e û hem jî tawankir e. Ev dibe sedem ku dîtin û bi servebûna vê tawanê dijwartir dibe. Ji lewre, tu wek ew kesê ku dibî şahid yan gumanan dikî, ku tawan li hevber kesê kêmendam tê kirin, hingê tu bêhtir girîng i. Heger tu li ciyê karê xwe, yan bi awayekî din, rastî yekî werî, ku te bawerî heye, ku ew kes berxeterê tawanê ye, divê tu werî nik me, nik polîsî.

Baş e ku liser bihizirî

Çend tişt hene, ku baş e mirov berî ku gilî li nik polîsî bike, li ser bihizire. Ev ew tişt in ku dikare ji bo serkeftibûna pişkinînê û ji bo ku pirsa te bikaribe here ta dadgehê, xwedî wateyeke mazin be.

- Sirê xwe ji bo ew dostênu ku tu bi wan bawerî dihênen bibêje û rewşa xwe ji wan re veke.
- Bi Mala Jinan (kvinnojour) yan Mala Mêran (mansjour) re pêwendî bike. Ew dikarin peyvên te di dadgehêk muhitemel de piştrast bikin.
- Rojnívîskek binivîse, ku tu li wir bi belge nîşan bidî, ku tu li ku derê û kengî hatiyî biçûkxistin, tu çawa gef yan jî lêdan xwariyî. Her wisa jî te çawa derb xwariye û derb li kîjan derê laşê te ketiye.
- Kincênu te yên ku dema lêdanê yan jî dema hêrişa cinsî, li ser te bûn, ne şo.
- Birîn û derbênu li te ketine bi belge nîşan bide, te derfet hebe wêneyênu wan jî bikşîne. Yan jî kincênu xwe bide doktorekî, ku ew ji bo te bikin belge.
- Wan gefdayinênu ku bi riya telesekreter, e-post yan jî SMSê li te tê kirin, biparêze. Paşê jî ew verêke ji dost û hevalên xwe re, ku ew ji bo te werin parastin. Ev dikarin bibin delîlên girîng.

Tu li vir piştgirî û alîkarî diwergirî

Ji bo kesê berxeter alîkarî heye. Gelek ji şaredariyan xwedî bernameyêñ alîkariyê ne, ku ji bo jin û mîrên berxeter bibin alîkar. Tu jî dikarî pêwendî bi yek ji van rêexistênu li seranserê Swêdê bikî. Li vê jêrê tu dikarî çend xetênu van rêexistinan bibînî.

Her wisa jî, alîkarî ji bo wan kesênu ku dixwazin helwêst û sincê xwe yê bizor û tûj biguherînin, heye. Pêzanîn nîşan didin, ku gelek kes dixwazin vê bikin. Ew kesênu ku li alîkariyek digerin, ku êdî dest ji bikarhanîna zorê û tûjiyê berdin, her dem di bin tirs û taswasa helwêsta xwe ya zor û tûjiyê de ne. Piraniya caran, xwe di bin barê şerm û tawanê de dibînin. Li gelek şaredariyan xizmetguzariyê nobedar û taybet hene, ku ew xwedî pêzanînan in, ku çawa ser bi karê van pirsan de herin û alîkariyê bikin.

Agehiyêن bêhtir

Mafê Zarok Li Civakê: www.bris.se
Nûnerê Dawerî yê Zarokan: www.barnombudsmannen.se
Encumena Pêşlîgirtina Tawanê: www.bra.se
Federasyona Malên Jibo Qurbaniyêن Tawanê: www.boj.se
Daîreya Qurbaniyêن Tawanê: www.brottsoffermyndigheten.se
Nûnerê Dadwerî yê Parlamentojê: www.jo.se
Xeta Aramiya Jinê: www.kvinnofridsljen.se
Federasyona Wekheviya Mafê Seksualiyê: www.rfsl.se
Navenda Giştî ya Krîzê: www.rikskriscentrum.se
Rêxistina Giştî ya Malên Jinan: www.roks.se
Federasyona Swêdê a Malên Jinan: www.kvinnojouren.se

Em dikarin alîkariyê bidin te

Zor di hemû cûreyên pêwendîyan de diqewime û li hemû warêن Swêdê. Em pê dizanin, ku her sal bi 10 hezaran kes rastî zorê têن, belku ber bi 100 hezaran jî.

Heger tu li nav rewşeke berxeterê ya biçûkxistinê, gefdayinê û zorê bî? Divê hingê tu herî polîs. Dibe ku tu li ber xetera tawanekî ciddî bî, ku gerek li nik polîs gilî lê were kirin.

Hingê ji vê Jimareyê re telefon veke: 114 14 yan jî, here nêzîktirîn qereqola polîsî. Di rewşa lezge û acîl jî, ji vê Jimareyê re telefon veke: 112.